


Germbûna gerdûnî (germahîya global)

Germahiya navînî ya li ser rûyê erdê di van 100 salên dawî de pir zêde bûye. Ev tê wê wateyê ku germahiya navîn li ser rûyê erdê her ku diçe bilindtir dibe. Germahiya navîn a li ser rûyê erdê niha ji 100 sal berê 0,8 pile zêdetir e. Ji vê re germahiya global tê gotin. Sedema germbûna gerdûnî (germahîya global) zêdebûna gazên serayê ên atmosferê ye.



Gazên serayê


Der dora erdê atmosfer e. Derviyê atmosferê valageh e (feza ye). Li fezayê pîleyê sermayê ji 270 santîgradê zêdetir e.

Atmosfer ji gazên cûrbecûr pêk tê, di nav wan de buhara avê û karbondîoksît jî heye. Ji buxara avê û karbondîoksîtê re gazên serayê tê gotin. Ji wan re gazên serayê tê binavkirin ji ber ku ew erdê ji germahîya tavê, ku li fezayê winda dibe diparêze. Dema ku ev pêvajoyên xwezayî pêk tê, hevsengiyek heye, û germahiya erdê domdar dimîne. Em dikarin bibêjin ku gazên serayê li dora erdê wek betanîyekê tevdigerin.

Di wêne/rismê jorîn de tê dîtin ku çawa hin tîrêjên germê yê rojê ji rûyê erdê ve têne kişandin, hin tîrêj di fezayê de têne xuyang kirin, hin tîrêj dema ku li atmosferê dikevin paşde vedigerin erdê. Dema ku ev bi xwezayî pêk tê, germahiya navîn li ser rûyê erdê bi qasî 15 pileyî ye.

Bandora serayê ya ku bi destê mirov hatî çêkirin

Sedemek girîng a germbûna gerdûnî, zêdebûna bandora serayê ye ku ji hêla mirovan ve hatî çêkirin. Bandora serayê ya ku ji hêla mirovan ve hatî çêkirin ji vê yekê tê ku em mirov zêdetir karbondîoksît belav dikin atmosferê. Ev ji bo bidestxistina enerjîyê bi şewitandina sotemeniyên fosîl, wek petrol, gaz û komirê pêk tê. Xêzkirina jêrîn hin çavkaniyên belavkirina karbondîoksîtê nîşan dide.



Petrol, gaz û komir gelek karbon dihewîne. Karbondîoksît dema ku karbon dişewite çêdibe û bi oksîjenê re bertek dike. Em ji karbondîoksîtê re gaza serayê jî dibêjin, ji ber ku belavbûna zêde ya karbondîoksîtê bandorê li klîmaya (avhewayê) li ser rûyê erdê dike.

Dema ku em sotemeniyên fosîl ên wekî petrol (neft), komir û gaz dişewitînin, karbona ku bi mîlyonan sal berê ji atmosferê hatiye derxistin derdikeve û di atmosferê de karbondîoksît zêdetir dibe. Em dikarin bibêjin betanîya ku li dora erdê ye pir stûr dibe. Dûv re germahiya navîn bilind dibe, û em li ser rûyê erdê hewayek germtir tecrube dikin - germahiya gerdûnê (global).

Çavkaniyên enerjîyê nedomdar

Petrol, komir an gaz çavkaniyên enerjîyê nedomdar (enerjîyê yê ku nayên nûkirin) in. Dema ku tiştê nedomdar e, ew nikare çend caran were bikar anîn. Yanî tê bikaranîn û diqedê.

Petrol, gaz û komir ji nebat û heywanên ku bi mîlyonan sal berê jiyane, çêdibin. Nebat û heywanên mirî herikine deryayê û di dawiyê de ew bi qatên qalind ên ax û herîye de hatin pêçan. Tebeqeya qalind a ax û herîyê bu sebeba zexta bilind. Zexta bilind, bi germahiya jeotermal re, bû sedem ku bermahiyên heywan û nebatên mirî veguherîne petrol (neft), komir an gazê. Bi mîlyonan sal lazim e ku heywanên mirî û bermahiyên nebatan veguherînin neft, komir û gaz.

Encamên germbûna global (Encamên germbûna gerdûnê)

Emîsyonên karbondîoksîtê yê ku ji hêla mirovan ve hatî çêkirin bandorê li şewazên baranê dike, okyanûsê germ dike û beşdarî helandina cemed û qeşaya deryayê dibe. Yê ku ji guherîna avhewayê herî zêde zirar dibinin kesên ku li cîhanê herî xizanin in. Lê belê encamên neyînî bandorê li Norwêc û welatên din ên dewlemend jî dike.

Şewazên baranê

Germbûna gerdûnê (global) bandorê li ser şewazên baranê dike. Li cîhê ku baran kêmbê, ew ê hîn hişktir bibe; û li cîhê ku baran bibare, dê baran jî zêde bibare. Ji ber vê yekê wê li hinek cih pir ziwa bibe, li hinek cih jî lehî zêde bibe. Hem lehî hem jî ziwabûn ji heywan, nebat û mirovan re pirsgerêkan çêdike.



Zêdetir hewayê giran

Rewşa hewayê giran bayê pir xurt û baran an jî berf a zêde ye. Di wêneya jêrîn de hûn zirara piştî bahozeke ku pê avahî, kolan û xweza tê wêrankirin dibînin. Piştî hewayê giran, peydakirina ava paqij jî dijwar dibe.



Qeşa dihele

Her ku germ dibe, qeşa li polan zêde dihele û cemedên li çaraliyê cîhanê her ku diçe piçûktir dibin. Ev jî bo mirov, nebat û heywanan li seranserê cîhanê encamên neyînî tîne. Jiyana heywan, nebat û însanên ku li herêmên bi qeşayê pir zêde dijîn, wê biguhere. Ger qeşa zû bihele, heywan û nebatên ku li ser û di bin qeşayê de dijîn dê nîkaribin xwe li gorî guhertinên bilez biguherin.



Mînakî, kêmbûna qeşayê dê li ser fokê, heywanek ku li ser qeşayê dijî bandor bike. Ew li ser qeşayê dijî, piçûkên xwe li ser qeşayê tînin dinê û li ser qeşayê radiwestin. Dema ku qeşa kêmbibe, jiyana ji bo foka dijwartir dibe, û hejmara wan jî wê kêmtir be. Mînakek din jî hirçên polar in. Hirçê polar jî li ser qeşayê dijîn, û ji bo wan fok, çavkaniyek girîng a xwarinê ye. Dema qeşa kêmbibe, wê cîhê hirçê polar ku li ser dijî jî, dê kêmbibe, dê hejmara wan jî kêmbibe.

Çavkaniyên enerjîyê ên dostê klîmayê

Em mirov hewceyê enerjîyê ne. Di heman demê de, em nikarin sotemeniyên fosîl bişewitînin, ji ber ku germahiya navîn a li ser rûyê erdê zêde nebe. Ev tê vê wateyê ku, ji bo kêmkirina bandora serayê divê em çavkaniyên enerjîya kesk ên ku jê re dibijên enerjîyê domdar (nûjenbûyî) an enerjîyê yên hewa-dostane tê gotin bikar bînin.



Kilde: Shutterstock

Hêza hîdro (avê), hêza bayê û enerjîya rojê mînakên çavkaniyên enerjîyê yên ku ji sotemeniyên fosîl zêdetir dostê avhewayê ne.

Ji peyvên mijarê nivîsê hîlbijartinek

Klîma(avhewa) global (gerdun) germahîya gerdunî (germahîya global)

bandora serayê gaza serayê gaza klîmayê (gaza avhewayî)

atmosfer refleks kirin tuvanîn

domdar nedomdar enerjî

sotemeniya fosîl giran hewayê giran

baran şêwazên baranê encam

Hemî nîgar ji Shutterstock.com ne